

ARMANC
Xwedi : Yekitiya
Karkeren
Demokrat
en Kurdistan
*
Ji Mehê Carekê
Dertê
Hejmar : 63
Tebax 1986
Buha : 10 Skr.,
3.5 DM

Armanc

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALİZM

Adress : YKDK, Nordenflychtvagen 20, 112 51 Stockholm, Tel: 08/52 87 56 Adresa têkili û naman : P.O. BOX 240 12 750 24 Uppsala/SWEDEN Postgiro: 50 37 99 - 9 / ISSN 0348-7385

Hînbûn û Hînkirina Kurdî Wezîfeke Welatperwerî ye

Heyeta Ewlekariya Millî ya Tirkîyê di civîna xwe ya meha hezîranê de dîsa li ser pûçkirina

tevgera gelê Kurd a netewî û demokratîk sekinî.

Heyeta Ewlekariya Millî ya Tirkîyê, ji serekkomar, serekwezîr, serfermandar, wezîrê parastinê, wezîrê karûbarê hundurî, wezîrê karûbarê derveyî, kumandarê giştî yê hêzên leşkerî yê behrê, yê hêzên sererdê, yê hêzên hewayî û kumandarê giştî yê cendirmân pêk tê û bi kar û barê dewletê yê ewlekariyê mijûl dibe. Niha, wek serekkomar, generale faşist Kenan Evren ji vê komîta ha re

Dî vê civînê de, generalên Tirk, serekwezîr Ozal û çend wezîrên wî serekî istixbarata Tirkîyê li ser hîndekariya zarok û gelê Kurd rawestiyâ. Di vî warî de çend

biryar girtin. Ew gelek baş têgî-hîstine ku gelê Kurd tenê bi barbaryên leşkerî naqede. Wê çaxê divê hînek metodên din ji bênlidarxistin. Ji van metodan yek ji,

Da'wa BEŞİKÇİ:

Şerê Navbera Ronahî û Tarîtiyê

Dr. İsmail Beşikçi; alimekî Tirk, ronakbîrekî ji şovenizm û njadperestiya Kemalîzmê şûşti, demokrat û mirovperweki rasîf... Nivîskarekî mîrxas... Ji bili endametiya wî ya Sendika Nivîskarêne Tirk, ji nehîn û ci jî eşkere bi tu partiyekê re têkiliyê wî yêndametiyye ï tunene. Lî wek ronakbîrekî, wek alimekî rasîf, xwedî li barê ser hustuyê xwe derdikeve, baweriya xwe bi ilim anîye, nebûye hîstî ideolojiya resmî; Kemalîzmê. Rastiya dora wî çiye, wê dibêje.

Hê gelek sal berê, bi memûretî û bi taybetî jî bi wazîfâ eskeriyê riya wî bi "Rojhilatê Tirkîyê" ketîye, pergiyê rastiyeke bûye. Li wir bi çavê xwe, bi jiyana xwe dîtiye, ku mîletekî bi ziman, bi dirok, bi rabûn û rûniştina xwe ji Tirkâ cuðatir diji. Navê ku karbîdesten Tirk lê kîrine, ew li xwe nake. Ji xwe re ne dîbê "Tirkên xas" û ne ji "Tirkên Çiya". Navê "Kurd" li xwe dike. Ev rastî di sera de meya ye û daye pey şopa vê rastiyê. Gelek heul daye, lêkolin kiriye, bi hûrî û kûrî li ser rawestiyaye da vê rastiyê bi her awayî binase. Tişte ku naskîriye, xwestîye bi dora xwe jî bide nasîn. Xwestîye çavê ronakbîren Tirk ên di bin esareta şovenizmê de korbûyi, veke. Gotîye; li Rojhilat miletek heye, ku ne Tirk lê Kurde. Li ser axa xwe, li welatê xwe Kurdistan hatîye bindestkirin; ji hemû mafşen xwe yêndî millî û demokratîk hatîye bêpar xistin; nav û hebûna wî tê ìnkarkirin; lê di bi zilm, zor û kedxûriyek dijwar de ye. Wek her mîletî, mafşen vî mîletî ji heye, ku qedera xwe bi destê xwe tayin bike, bibe xwedan mafşen xwe yê millî û demokratîk, bîghê azadiya xwe.

Loma ji awîrîn çavşoriya karbîdesten Tirk, kîşandiye bi ser xwe de. Serdesten vî welatê ku di bin perda şovenizm û njadperestiyê de res hatîye xeniqandin û di seve-tariyê de maye, dîtiye ku yekî "xwe nenas" dixwaze vê tariya reşxenîqi birînê. Yekî ku rabiye bi meş'ala destê xwe dixwaze ronayîya dinya rastîn rî der û dora xwe bide...

Vê yekî tirs di dîle karbîdesten de firandîye, xewa wan i şevan revandîye. Ew bas tê gîhîstine, ku tîr yek be, sibe wê bibe deh, dubise wê bîghê bi hezaran. Loma ji bi hîrsek tûj û êrîsek hov xwe avêtîne ser İsmail Beşikçi. Gumanâ wan ew bûye, ku tîr karibin meş'ala destê İsmail Beşikçi bitemirînin, serî lê xwar bikin, sibê wê yekî din nema bi vî awayî, çavê xwe ber bi ronayîya dinya rastîn ve ke.

Dûmahîk 1.6

serokatiyê dike. Li gora madda 118 an a qanûna esasî ya Tirkîyê, hukumet, bîryarên vê heyetê, yênu ku di derheqê "hebûna dewletê", "yekîtî û parçenebûna welêt" de ne, mecbûr e ku pêştirîn (ferzîrîn) bi cîbîne. Li vir, ji "yekîtî û parçenebûna welêt" quesda kolonyalisten Tirk ew e, ku Kurdistan bila tim kolonî bimîne û negehê azadî û serxwebûna xwe.

li Kurdistanê bikaranîna hîndekariyeke nijadperestîn, şowentirîn û asîmîkartin e. Esas vê çeka asîmîlasyonê tenê iro nayê bikaranîn. Ji sedan sal vir de ye, ku tête domandin. Lî belê icar, diktatoriya faşist, dixwaze hîndekariyeke asîmîlasyonî bi hînek wasitayê modern, wek kampanyekê bîdonîne.

PILAN TÊ BICÎANÎN

Heyeta Ewlekariya Millî ya Tirkîyê, ditin û bîryarên xwe, yênu vê civînê, yênu li ser pûçkirin, qirkirîna Kurdan di warê hîndekariyeke asîmîlexwaz de, tavîlê hewaleyî

Dûmahîk 1.7

Reha İSVAN:

Tirkîye Ji Demokrasiyê Dûre

Asambleya parlamentaran a Konseyâ Ewrûpa di dawîya hezîranê û destpêka tîrmehê de li Istenbolê civiya. Wek tê zanîn, ev konsey ji çend gruban pêk tê. Ji van gruban yek jî gruba "Sosyalist" e. Gruba "Sosyalist" (yanî gruba sosyal demokrat) ji bo ku di vê civînê de besar bibe, şerîk berpêş kir. Ew şerta jî, ji endamên DîSK-ê, Komela Aştyî, malbaten girtîyan, nivîskar û çend sosyal demokratan re pêkanîna semînerekê bû. Gruba "Sosyalist" bi vê semînerê, dixwest di heqê rewşa Tirkîyê ya siyasi de agahdarî bigre. Ji ber ku wan baweriya xwe bi agahdarîyên diktatoriya faşist nedianîn.

Ev şert bi cî hat û semîner çebû. Lî belê nehiştin, ku malbaten girtîyan di civînê de besar bibin. Li rex diktatoriya faşist û hukumeta Ozal; liberal û muhafazakarîn Ewrupa, sosyal demokraten Tirkîyê ji li dij vê semîner bûn. Ji sosyal demokraten Tirkîyê, serekwezîrê kevn Ecevit digot; "Ez naxwazim ditin û intîbâyîn bas yêndamên Konseyê di heqê Tirkîyê de bênguhertin." Ji bo vê yekî jî Ecevit di semîner de besar nebû. Vê şela Ecevit, ji cunta faşist re bû alikarı.

Serekî Partiya Sosyal Demokrat a Gelêri(SHP) Erdal Inonu, dijitti-



Reha İsvan



İsmail Beşikçi ji bo rastîya gelê Kurd anî ziman, 11 salê xwe di zîndanê de derbas kir.

Azadî Ji Bo Î. BEŞİKÇÎ

İsmail Beşikçi berê ji du caran (her carê sê salan) di zîndanê de mabû. Sebebê zîndankirinê wî, kitêbên wî yên li ser mesela Kurdî bû.

Alîm Tirk, mirovperwerê hêja, demokratê rastîn Dr. İsmail Beşikçi, ji bo nivîsandina namekê ku têde behsa Kurdan kiribû, di 30-yê Tîrmeha 1981-ê de 10 sal hukmê zîndanê xwar û ev pênc sal in, ku di zîndanê reş û tarî yê diktatoriya faşist a Tirk de bendekirî ye. İsmail Beşikçi, hê di sala 1979-an de ji ber kitêba xwe ya bi navê Nazariya Dîrokî Ya Tirk û Pirsa Kurdan 3 sal hukmê zîndanê xwaribû û di zîndanê de bû. Di dema girtî de, ji dervayî welat gelek protesto çûn ser hukumeta Tirk da İsmail Beşikçi bê berdan. Yek ji wan jî Sendika Nivîskarêne İswîç-

rî (Swîsî) bû. Dr. İsmail Beşikçi ji di zîndanê de name ji seroka Sendifîk; Mausse Boulanger re şand û xwestipasî wan bike. Lî çîma di namê de li ser rewşa Kurdan, daxwazên wan rawestîya bû, karbîdesten Tirk geleki aciz kir. Carek din mehkeme lê rakirin û bes ji bo namekê 10 sal ceza danê. Pişti cezayê berê xelas kir, vê carê ji bo deh salê zêde wî xistin zîndanê. Dr. İsmail Beşikçi di dema mehkeme faşist de serê xwe li ber hakim û mudefiâmeh mehkemê xwar nekir, namûs û şerefâ alîmîyê nextist bin piyê militartîstan, bi Dûmahîk 1.6

BEŞİKÇÎ Kî Ye?

Nivîsa we di hejmara be de.

Ji 12 ê İlona 1980 i Bi Vir de

Di Zîndana Diyarbekir De 32 Girtî Hatin Kuştin

* Îşkence, ji dewra avabûna dewleta Tirk bingehêkî siyaseta dewletê ye. Lî bi hatina dîktatoriya faşist, çavşor û xwînrêjiyek nuh rapilikî.

* Ferhat Cemîloglu "pîsiya insan bi min dan xwarin".

Lîdân, îşkence û rewşa xerab a zîndanê hatin kuştin. Heke rojnamevan hin parlament yan jî dê û bavîn girtîyan, ji serekwezîrê diktatoriya faşist Tur-

Dûmahîk 1.7

Du Dem û Du Buyer

Reşoyê Qerejdaxî

Em giş dizanin ku hêzên kolonyalist ji bo karibin welatê me di bin destênen xwe de bigrin çi hovîti, nerindî, dek û dolab û fesadî ji destênen wan hatibe kirine û iro ji dikin. Ji bo ku gelê me rizgar nebe, gelek caran welat serobinê hev kirine, Gund û bajar şewitandine. Bi kurtayî, li welat xwin wek lehiyê herikandine. Dîrok şahidê vê hovîtiya wan e. Lê belê dema meriv rûpelên dirokê werdigerine, meriv dibine ku hêzên kolonyalisten Tirk gelek nebaşî û gelaciye din jî kirene. Bi şîti gel berra hev dane, gelşen di nabêna wan de kûrtir kirene. Heta meriv dikare bibêje ku ew dijayediyen - dînî, eşîri û. h. w. - nav gel geleken wan ji ali padışa-hen Osmaniyan ve bi zanyarî hatîne derxistin. Ji ber ku wan, ji van dijayediyen fede didtin.

Do padışa-hen Osmaniyan bûn iro jî neviyên wan ên virnî vî karê xwe didominin. Di vî warî de bi hezaran mînak hene. Dixwazim li jêr, li ser vê şîti û nerindîya wan û çawa gelê me berra hev dane mînakek gelek interesant bidim.

Di sala 1985 an de di kovara Tarîf ve Toplum hejmara 17 an de nivisarek bi navê "Bi Çavê Ewrûpayîyan -Rojawayî- Civata Osmanî û şahîdiyek li ser Êzidiyan" hat veşandin. Nivîskarê vê nivîse Mehmet Bayrak di meqala xwe de pirtûkek nivîskarekî Frans-

siz(*) dide naskirin ku çûye li Kurdistanê geriyaye (1836-37). Di vê nivîse de qala hin bûyerên gelek ecêb hatiye kirin:

"Heta gelekî berê waliyên Diyârbekrê, Mûsile û Mêrdinê ji bo ku hîsseki şehîdbûnê bidin girtiyan, cellad ji Êzidiyan hildibijartî".

(Tarih ve Toplum, hejmara 17, rûp. 71) Meriv di van rîzîn jorîn de dibîne ku karbdesten Osmaniyan çawa bi zanyarî gel berra hev dane, dijayedî û dijiminayetiyan bê bingeh -sûnî- di nav refîn gel de peyda kirine. Bi vê kirene wan, him Kurd dikuştin him jî wan dikirin dijiminê hev, lê wan bi xwe jî wek dîkî sipî xwe jî nav didan ali. Ew dijayediyen ku iro di nabêna gelî me de hene û carcarna li ber têkoşîna serxwebûn û azadiyê dibin gelş -problem-, pirrîn wan bi vî hawî jî ali dijimin ve hatine derxistin. Wan gel berra hev daye ji bo ku karibin serdestiya xwe bidomînin. Ü bi rastî di vî warî de karbdesten Tirkan gelekî jîr in. Kevneperesten Tirkan qet tu cari tu serihîdanek bes bi darê zorê neşkandine û nikarî bûne bişkinin. Wan, di hemû serihîdanek de bi fîlbazî, dek û dolab gerandine û ji van dijayediyen nabêne fede dîtine. Îcar, a hîn xerabtir jî iro jî van metodîn xwe bi karînîn û ji do bêtir jî yekîti û hevkariya gel qels dîkin, ji têkoşîn û xebatê dûr

dixin. Lî hin "hêzên siyasi" jî hene ku vê siyaseta dijmin nabînin, yan jî naxwazin bibînin. Li ser vê yekê minakek gelek interesant heye.

Wek tê zanîn di van du salêن dawî de li Kurdistanê hin bûyer çebûn. Cûnta faşist hejmara leşkereñ ser sînor zêde kirin, sînor him kolan, him bêtir mayin kirin û him jî ronî kirin. Gelek gundêni li ser sînor vala kirin. Bi vê jî ne hatin ser, bi zor çek li gundiyan belav kirin û gundi mecbûr kirin ku ji dewletê re notirvanîyê bikin. Ew gundiyan ku çek negirta wê demê digotin hûn jî hevalê "terorîsta" ne. Jê pîstir tişten xirabtir bi serê gundiyan de anîn.

Di meha Çileyê Pêşin de li gunde Gokçekanat ji wan kesen ku çek girtibûn du heb hatin kuştin. Cûntayê de beyanen xwe yê resmî de got ku van kesena ji ali terorîstan ve hatine kuştin. Lî dû re bîrâyê yê kuştî -Ziya Çakas- got ku ev ne rastin, rastî wisaye: Çend polîsîn Tirk kincen wê herêmî li xwe dikin, (yani bi gotina wan xwe dixin şîklê terorîstan) û diciñ gund, dibêjin em birçî ne ka nan bidin me. Wê demê İbrahim Çakas û Mustafa Çakas wan nas dikin, dibê hûn polîs in. Li ser vê her duyan jî bi ser hev de dikujin û diherin. Ziya dom dike, "van çavên min dibîne ku dema terorîst

bûna xwe hêzên dewletê karibûna ew bigirtina". "Yanî ne terorîst e, muhaqeq pilan ji ali hêzên dewletê ve tê hazir kirin, ji bo ku çavê gel bê tirsandin." (Yenî Gundem, hej. 4, rûpêl 18-19) Bê guman bê hejmar bûyerên wisa hene. Ji van hinek hene, ku em pê dizanin, lê gelek jî hene ku em pê nizanin. Lî belê em bi tiştekî baş zanîn ku cûnta faşist ji wan teverîn ku li Kurdistanê hat çekirin baş fêdî dibîne û dixwaze vê tevhîeviyê her bidomîne.

Ji ber ku di domandina van bûyeran de tu zirara wan tuneye, her kara wan heye.

Di van her du mînakîn jorîn de me dît ku kevnperesten Tirk ne bes bi qewet û leşkereñ xwe ve hov û har in, ew, her wisa bi siyaseta xwe jî felbaz in. Ü jî pêşyên xwe ve xwedî tecrûbe ne. Loma jî burjuaziyê Tirk ji salan ve ye ku dikare xwîna gelê Kurd û Tirk birjîne û wan ji hemû mafên însanî û demokratî bê par bihêle. Ji bo ku em karibin rojekê berê welatê xwe rizgar bikin û Kurdistanek serbixwe û demokratîk damezrinin, dibê em bi dijiminê xwe û siyaseta wî bas zanîbin. Gava em bi vê yekê nizanîbin, emê nikari bin bersîva bindestiya xwe ya hita iro jî bidin. Wê gavê ji serkevtina me jî gelek dijwar dibe.

Namén Xwendevanen

ARMANC A NÛ PÎROZ BE

Jiyanek dirêj ji Armancê re daxwaz dikim û hêvîdarim ku Armanc bi zimanê xwe yê Kurdi zêdetirî deng û basên Kurdistanê û cihanê cîhkî girîng bistîne, di pêşbirin û xwurtkîna zimanê Kurdi de.

Gava min Armanc a nû (hejmara 62 a) xwend hinek kêmâsiyên teknikî bala min kişand. Ü ji bo daxwaza Armancê ya rexnekirinê bi cî bînim min rîexistina van kêmasiyan pêwîst dît:

* Ji van kêmasiyan a yekem, tarîx ne nivîsandin e. Yanî li ser rûpelek rojnamê divê tarîx bê nivîsandin. Rûpelek bê tarîx, mirov nizane ya kîjan hejmare ye û kengî derketiye.

* Ya duyemîn, wek hûn jî dizanin di her buyerâ ku rojname belav dike divê bersîva pênc pîrsan bide, evana: "Kî, Ci, Kinga, Li ku, Çawa" û hûn bi xwe jî di nama xwendevanen de dibêjin, "Di nûcayan de tişteku lê miqate bê kirin... tarîx, cih û armanc... bê diyar kirin". Lî gava mirov li buyerên ku Armancê belav kiriye dinêre, piraniya wan "kinga" yanî tarîx rî nedaye. Mesela, Hevpeyîn bi Dr. Celîl Celîl re, Êrişa Afrîka Nijadperest Li Ser Zambiya, Zimbabwe, Buyerâ Çernobil, Pêşmerge Pêş De Diçin.

Di hinek buyeran de ji Armanc dibêje "meha Gulânî", "ya beri ya niha", bê ku turîxa buyeran bide, buyeran belav dike. Armanc bi xwe rojnamek mehani ye, buyeran ne bi meha, lê li gora roja, meha û sala divê bellî bike. Mesela di behsa "Şai-re Kurd Hêmin" da dibêje "berî mirina xwe li Urmiyê bi navê Surwe (Sur) kovarek edebî derdixist" mirov nizane ka ev kovara ha ci tarîxe de derketiye û çiqas jiyye.

Ez hêvîdarim ku Armanc wê di hejmaren bêne de buyerâ bi zimankî hêsan û bê kêmâsi pêşkêsi xwendevanen xwe bike.

Karkerekî Kurd Li Fransa

JI REDAKSIYONA ARMANC RA

Hevalen Hêja!

Ez xwendevanekî rojnama "Armanc" im. Bi vî şîklê nuh ku Armanc derdikeve ez pir dilxwes bûm. Dixwazim pêşin, wan hevalen ku ev kar û barên "Armanc" û dene pêsiye xwe wan pîroz bikim.

Derketina rojnama Armanc bi xweru zimanê Kurdi ji bo parastin û pêşveçuna çanda Kurdi pi girîng e. Hew qasê din jî pêwîst e ku Armanc, lêkolînê dîrokî, civakî, ekonomî û perspektifê yê politik şanî xwendevanen xwe bike.

Ez serfiraziya we û "Armanc" û dixwazim.

Cotkar
Celle-Almanya

İmbazî Delâli,

ARMANC a newîya pîya sima zu gamê çekerd, gamêda newî, gird ew rind. Ma umîd kem ki ARMANC do roz bi roz diha weş bivejîyo wu verdîna çend rozna-

man diha akero.

ARMANC a newî wa welatê marê, wa ma pêrinrê êmbarikbo.

E. Pamukcu

Redaktorê AYRE

JI REDAKSIYONA ARMANC RE

Hevalen delal!

Wek em baş dizanin ku kolonyalîstan welatê me kirine bin destê xwe, bi her awayî li hember hebûna gelê me rawestiyen e. Zimanê me hatiye qedexekirin, sin'et û çanda me hatiye înkâr kirin. Lî belê ev armancen han wek wan xwestîye nehatiye pêkhatin. Gelê Kurdistan her wextekî li hember aşînilasyon û înkârînê rawestiyate û xwestîye zimanê xwe pêşda bibe, sin'et û çanda xwe firehtir bike.

Derketina rojnama Armanc, bi zimanê Kurdi, li hember kolonyalisten ku dixwazin zimanê me bidin ji bîrkirin bersîveke gelek mezin e. Ji bo vê yekê em derketina rojnama Armanc seranser bi zimanê Kurdi bi dilekî germ pîrozîn û ji bo domkirina wê bi her awayî piştgirtinê dikin.

Komîta Piştgirtina Rêya Şoreş
(Li Swêd)

DI DİROKÊ DE EV MEH:

- 7 Tebax 1984: Têkoşerek PPKK Bahadînê Sefer di hûdûde Suriyê de ji ali metîngîhêkaren Tirk hat şehit kirin. Ew Cizîrî bû.
- 9-12 Tebax 1925: Serihîdana Reşkotan û Reman tekçû.
- 9 Tebax 1972: Helbestvâne Kurd Qedîran (Abdüllâzîd Azîz Cam) li Şamê çù heçqa xwe. Dema rehmet kir, 56 salî bû.
- 10 Tebax 1920: Peymana Sewîre hat imze kirin.
- 10 Tebax 1978: Têkoşerek gele Kurd, militanê PPKK, Endame Komîta Karger a DDKD (Istanbul) xwendevanen Uni-versîte Teknikî ya İstanbul, nûnere DİSK a Karkeren belediya Fatîhe Haki Uzâr li İstanbulê ji ali fasîtan ve bi pilamî hat şehit

Stiriyen me

Bavê Nazê

HOZANÊN

ZIMANÊ KURDİ

Zimanê kurdi-zaravê kurmancî-jî wek xwediye xwe ketiye ber şeg û peka. Loma jî ketiye rewşek reben û belen-gaz. Her û her gotinê wî ciyê xwe diguherînin, cî û rehetiyê ji xwe re nabînin. Hîn nagîhênu ku serê xwe deyîn ser balgihekê, "mamostak" di wan de derdikeve, bi hêrs lingê xwe li wan dixe, "merşê" ji bin wan dikşîne, merşâ xwe ya qezûzî li bi wan radixe.

Gotinê kurdi jî emrê xwe dispîrin Xwedê, tevî ku xwesiya xwe li ser ciyê xwe yê nuh nabînin. Hêdi hêdi li bin xwe ciyê xwe dikolin. Lî belê vê rewşa han jî domnake, "hozanek" û din li wan rast tê û wan serûbinî hev dike. Di nav lepên wî de dibe care-cara gotinan, lê bêfêde ye, her ew nêçîra xwe jî nav lepên xwe bernade. Belenga-zan gotinê kurdi ji neçarî li ser teriya xwe rûdinê. Lî hîn nagîhênu mexelê xwe çêkin "profesorek" li wan derdî, rebenan berê çavtîsiyayî ne, hemâ di ciyê cih de ji ber wî radibîn û dîlanê dikan. "Profesor" bi govenda wan qâil nabe, wan dide ber şiv û duran. Her gotinek jî eşâ nava xwe barek hêşir dîbarîne, kumik û daçekan ji ber xwe dibe. Gotinê mî dibin nîr, ên kurdi dibin biyâni, hevok bi hawakî wiha dertênu ku ne kesî nîvisiye ne jî kesî bihîtiye.

Berî demakê, min nîvisek amade kiribû ji bo Berbangê. Di nav nîvisê de gotina "esman" hatibû bikaranîn. Çawa Xwedê jê stendibû ku hatibû bîra min, ez nîzamîn. Lî min hîn bêtir bêbextik pê re kir, gava berî redaksiyonê min gotar rê hevalekî da.

Gava çavê hevalê hêja bi gotina "esman" ket, kirasê xwe çirand. Ji min pîrsî;

• "Esman" çiye!

Min bixwe, bi awakî matmayî lê nîr. Lewra heval ji herêma me bû. Madam em ji herêmekê ne divê gotinê me jî wek hev bin. Min mana gotina "esman" bi zimaneki din jê re got. Wî li min vegerand:

-Mexsedâ min ne mana wê ye, te bi şasîti nîvisandiye, divê "asîman" bê nîvisandin.

Ji tîrsa ku serîşkiti bi dû min keve min bi ya wî kir û li şûna "esman" min "asîman" nîvisand. Hevalê min bi serfirazî serê xwe rakir û xwest gotinê din jî tevlîhev bike. Xwedê kir, min bi ya wî nekîr. Lewra tişte ku di redaksiyonê de hat pêsiya min, wê bihişa, ku gotara min ji nuh ve bê nîvisandin.

Ez serê we naêşinim, min li pêşberî redaksiyonê dest bi xwendina gotara xwe kir. Gava ez gîhiştîm peyva "asîman" çavên berpîrsyar beloq bû û devê wî ma ji hev. Ez mam rawestiyayî da ko ez bizanibim berpîrsyar ci dixwaze. Camêr nehiş ez di rewşa bendibûnê de bimînim, ji min pîrsî:

• "Asîman" çiye!

• Yanî "esman"

• Dêmek wîlo ye, "esman" binivise.

• Na qurban çenâbe, çimkî wê navê min bi serîşkiyê derkeve û ez vî tişte ji xwe re naxwazim.

• Tu bermeqîlûb dipeyivî. Tê serîşk bî, heger tu li ser a xwe bimîni.

• Ma ne qurban "asîman" ne gotina min e.

• Di vir de berpîrsyar bi tîrs got;

• -Hema ne ya Celadet be.

Ez di ber xwe de bişîrim û min lê vegerand:

• -Ne ew e, lê li dora wî ye...

Ma kî nuha xwe dide bi Celadet*


Dûre, min xwendina gotara xwe dom kir; gotina "asîman" du carên din bi min re derbasbûn. Berpîrsyar jî yek nekîr dudo, car û nîvekî ev gotina "asîman" û car û nîvek din jî bi "esman" nîvisand. Loma jî gotina "asîman" bû "asman" û ya "esman" bû "asîman". Hûn bi xwe nemînî ecêbmay. Bi Qurana mela xwendî herdu gotin jî rast û durust in. Ma yê bê na kî ye ?

kirin. Ew Bîthî bû.

11 Tebax 1919: Li ser navê Cemiyeta Teallî a Kurdistan heye tek dice konsolosxana Amerika, mesela Kurda dide naskirin.

NÜÇEYÊN DERVE

Rezaletiyê Reagan en Civakî



Kesên bê xani yên li Los Angelesê ketine dorê ku perçek nan hisin. Dema det bi belakirin dikan, tevîheviyek mezin dibe. Tera herkesi nake. Yen dawî destvala vedigerin, dijin.

Ev şes salin, ku Ronald Reagan li ser hukum e. Amerika Yekbûyi berî ku Reagan were ser hukum dîsa di nav rezaletiyê civakiyê de bû. Bi milyonan insan bê kar bûn û disa bi milyonan insan bê mal bûn. Lî belê ev rezaleti, piştî ku Reagan hate ser hukum 3-4 qat zedetir bû. Iro li Amerika Yekbûyi ji zêdeyî 12OOOOO insan, bê kar in û ji zêdeyî 6OOOOO insan ji bê mal in. Ev reqemên han yên vê meha dawî yên resmî ne. Îcar gelo yên derveyî resmî çiqas in?

Li gor nûce û lêkolinê rojnameyên Amerikî dê ev reqem roj bi roj zêde bin. Dîsa li gor nûçeyên wan, bi milyonan insan tim rîwî ne. Ango ji eyaletekê an ji bajarekî derbasî eyalet an ji bajarekî din dibin. Kesên wiha di nav istatistîkan de pir xuya nakin.

Ji bo mînakî eme tenê li rewşa bajarê Los Angeles li eyaleta Kaliforniya ya dewlemend binerîn. Tenê li Los Angelesê ji 5OOOO insanızdetir kes di kolanan de dijin. Ji bo alikariya van insanan

eyaleta Kaliforniya tu tiştî nake. Ji ber ku ermana Ronald Reagan wiha ye. Tenê dêr alikariya van kesan dike. Heftê carekê ji bo nêzî 2OO kesan xwarin tê belakirin. Lî belê kesen ku dikevin dorê her careji 1000 kesi zedetir in.

Kesên bê kar alikarî ji dairâ civakî distin. Ev alikarî mehê 228 dollar e. Lî belê ev alikarî têra kirya xaniyekî an ji odekê ji nake. Niha kesê ku şâştiyekê bike heya 60 rojan nikare alikarî bistîne. Michael Mucyka ji bajare Los Angeles,

Le DUAN Mir



danê. Le Duan cardin ji hepsê reviya û li dij dagirkarê Japonî serokatiya têkoşinê kir.

Le Duan, di sala 1950-an de bû Sekreterê Yekem ê PKV-e. Ji ber karûbarê xwe yên giran, nişana Lenîn girtibû.

Amerîka Terorîstan Diparêze

Di hefta dawî ya meha Tîrmehê de, serekê réxistinê terorist wek UNITA, KONTRA, kevnepersetên Afganistan û nûnerên Polpot li paytexa Amerika Yekbûyi civiyan.

Li gor rojnama Washington Post, Reagan dixwaze ji bo "diploma-

ji ber ku dereng çübû ba asistanâ xwe 60 roj ji alikariya daîra civakî mehrûm bû. Michael Mucyka wê rojê bê pere bû. Nikaribû li otobosî siwar be. Da rî û bi peyati çû. Lî belê saetek dereng ket.

Reisê Belediya Los Angelesê Tom Bradly bi xwe reşik e. Li gor wî problemen civakî ji politika civakî ya Reagan tê. Heya niha tu alikarî ne ji dewleta Kaliforniya ne ji Washingtonê nehatiye. Li gor Tom Bradly bêkarî, dizî, fuhuş û kuştin heya dawiya vê salê wê 2-3 qat zêde bin.

Ji aliye din girtigehê nû têr avakirin. Dê hejmara polisan bête zedekirin. Niha girtigehê ku 3700 hucreyên wan hene, di inşaatê de ne. Di kolan û di meydandan de reklama mesleka polisiyete tije ye. Li gor waliyê Koliforniya George Deukmejian, perê van girtigehan û polîsên nû dê ji tasarrufen ku ji beşa civakî hatine kirin, bê.

Îngilîstanê Boykot Bikin!

Rêxistina Hevkâri Ya Dewletê Afrika (RHDA) bi 50 nûnerên xwe, 27-ê Tîrmehê li paytexa Etiyopyayê, li Addis Ababa civînek çêkir. Di vê civinê de piştî raberzînek (munaqaşê) dûr û dirêj biryara destpêkirina kampanyakê li dij politika Îngilîstanê (Britanyayê) ya li ser Afrika Başûr, hat stendin.

Etiyopya û Nijerya ji zû ve pêşniyar û daxwazek wisa pêşkêşî RHDA-yê kiribûn. Derketina vê biryare ji bo van herdu dewletan serfiziyek bû.

Di dawiya komcivinê de beyanek hat ilankirin. Di vê beyanê de Amerika Yekbûyi, Îngilistan, Fransa, Almanya Rojava û İsrail ji bo hevkariya xwe ya ekonomik (aborî) û teknika atomî bi rejima nijadperest ya Afrika Başûr re, têr mehkûm kiran.

Di beyanê de biryara alikariya dewleten Afrikî yên li hawîrdora Afrika Başûr ji heye. Di beyanê de wiha tê gotin:

-Nûnerên komcivinê biryar didin, ku hem aborî hem ji materyali alikariya ANC (Konseya Netewî Ya Afrika) û rîxistinê din ku li dij Afrika Başûr şer dikan, bikin.

DANİMARKA

Hukumeta kevneperset a Danîmarka dixwaze bombe-yen atomî yên NATO li Danîmarkayê bi cî bike. Eger daxwaza hukumetê bi cî neyê, iştimala hilbijartineke nû derêté holê.

Serekê Partiya Sosyal Demokrat a Danîmarka, Anker Jorkensen li ser vê babetê wiha got;

-Danîmarka ne di aştiyê de ne ji di şer de, bombeyen atomî wê bi cî neke.

Serxwebûna Namîbyayê

Qebûl Bike!

Sekreterê Netewê Amerîka Yekbûyi (NY) Javier Perez de Cuellar, gazî rejîma nijadperest a Afrika Başûr kî, ku daxwaza navnetewî ya li ser serxwebûna Namîbyayê bi cî bîne. Perez de Cuellar vê gaziyê di konferansa ku ji bo Namîbyayê hatîbû bi rîkxistinê de kir û rexne anî ser hukumeta Afrika Başûr a nijadperest.

Namîbya berê mîtingha Almanya Rojava bû. NY di sala 1920-an de mafî idarekirina Namîbyayê da Afrika Başûr lê ev maf di sala 1966-an de cardin ji Afrika Başûr hat stendin. Lî belê Afrika Başûr 30.000 leşkeren Kubayê ku li Angolayê ne, dike mane û daxwaza NY bi cî nayne.

Perez de Cuellar di axaftina xwe de got, ku wî xeberê daye hukumeta Pretoryayê ku NY biryara xwe ya 435-an dê di meha teba-xê de bi cî bîne.

Îsraîl Îcar Sûriyê

Bi Amerîka Tehdît Dike

Serokwezirê Îsraîl Şimon Peres di axaftina xwe ya li ser 10 saliya "Îrişâ Entebbe" yê de, berpîrsi-yariya îrişen balafirgehê Madrid, Roma û Viyana vê carê kir ser Sûriyê. Peres di cîkî axaftina xwe de got ku "eger hûn alikariya xwe ya bi terorîzma navnetewî bidin domandin, îcar Sûriye ne tenê ji

Îsraîl re, wê ji hin dewleten din re ji bibe hedef." Qesta peres, Amerîka ye.

Ev yek baş dide xuyakirin ku, îrişâ Amerîka ya li ser Libya ciyê xwe girtiye, bûye aletek tehdit û şantaj di "têkiliyê navnetewî" de.

MIREKA



Amerîka Yekbûyi Terorîzmê Geş Dike

H.MIZGÎN

Amerîka Yekbûyi, piştî hilweşandina diktatoriya faşist a Somoza, giraniya xwe da, ku şoreşa Nikaraguayê hilweşine. Mirovén Somoza tev de reviyan çûn Hondurasê. R. Reagan bîryara alikariya van faşist û kevnepersetan ji Kongra Amerîka Yekbûyi derbas kî. Alîkari ne tenê ya peran bû. Talîmkirin û hînkirina van kevnepersetan ji girt ser milê xwe. Kesen ji CIA û kesen li Vietnamê qesabıya insanan dikirin, şandin Hondurasê ku mirovén Somoza hîn talankirin, kuştin, xirakirin û diziyyî bikin.

Amerîka Yekbûyi bîryara rawestandina ticaretâ bi Nikaraguayê re ji stend. Çembereke ticâri li dora Nikaraguayê kişand. Bi rastî ev kirina ha derbek mezin li pêşdeçûna Şoreşa Nikaraguayê da. Lî belê bi armanca xwe ya hilweşandina iktidara Sandînistan bi serneket.

Heya niha bi êrişen Kontrayê zêdeyî 12.000 insan hatine kuştin. Bi dehan gund, dêr û dibistan bi êrişen Kontrayê xirabûn, şewitîn. Kontras tenê bi van êrişan têr nabin. Carna rojnamevan û fotografkeşen biyanî ji rehîn digrin. Zor didine wan ku ji bo wan li dijî Sandînistan kar û propaganda bikin. Lî belê bisernakevin. Dawiya dawî mecbûr diminin û wan serbest berdidin. Kongra Amerîka Yekbûyi pêşniyariya R. Reagan a li ser alikariya Kontrayê (100 milyon dollar) qebûl kî. Ev tê wê manê ku terorîzma Amerîka Yekbûyi li dijî Nikaraguayê dê hîn xurttir dom bike. Dîsa ev biryar tê wê manê ku Amerîka Yekbûyi ilana şerî dijî Sandînistan dike. Bi rastî rewşa Nikaraguayê dijwar e. Her tim talûka êrişâ Amerîka Yekbûyi di holê de ye.

Ji aliye din, hin bûyeren pozitif ji cedîbin. Welatên di gruba Contadora de piştgiriya xwe bi Nikaraguayê re, ilan kirin. Kuba ilan kir ku wê bi her tiştên xwe alikariya Sandînistan bike. Dadgeha Navnetewi li Haagê alikariya Amerîka Yekbûyi ya ji Kontrayê re, mehkûm kî. Dadgehê di bîryara xwe de ilan kir, ku Amerîka Yekbûyi, bi talîmkirin, hînkirin, bi çekdarkirin û finanssekirina hêzên li dijî Nikaraguayê, mafen gel dixe bin piyan.

Xuya ye, ku Reagan tiştê ku anî serê Grenada dixwaze bîne serê Nikaraguayê ji. Lî belê Şoreşa Nikaraguayê di nav gel de wisa bi cî bûye ku her tevgera Amerîka Yekbûyi li dijî Nikaraguayê xelkê zaftî nêzî hev dike, kîna gelê Nikaraguayê li dijî Amerîka Yekbûyi kûrtir û tüjtir dike. Şoreş roj bi roj xurttir dibe. Ji ye yekê ji bo Amerîka Yekbûyi û terorîzma wê, hilweşandina Sandînistan dibe ku di xewnê şevan berpêş were, lî di rastiya jîyanê de tu cari wê neqewime.

Swêd

Nijadperestan

Ronny Landin Kuştin



Nijadperestan, di 20-ê Hezîrana 1986-an de hovîtiya xwe cardin nîşan dan. Dema Ronny Landin xwest, ku hevalê xwe yê biyanî li dij nijadperestan (Skin-heads) biparêze, bi kér û daran hat kuştin.

Ji bo bîranîna Ronny Landin, di 4-ê Tîrmeha 1986-an de li Stockholmê mîtingek hat pêkanîn. Di vê mîtingê de, li ser navê Christina Hermansson (parlementerê bajarê Orebro), serekê Federasyona Nijadperestî Rawestîne, Kari Fraurud wiha got:

-Di nîveka sala 1986-an de bayekî sar ji ser Swêdê derbas bû, çû. Zor, zora siyasi hate welatê me ji û xwe bi şiklîn cûda cûda şanî me da. Kesen ku hatibûn civinê, sloganên li dijî nijadperestî di destê wan de bîstek ji bo hurmetâ Ronny Landin rawestîyan. Li ser navê Komîta Nijadperestî Rawestîne,

KURDISTAN PRESS



DİLOĞU DA DERDİKEVE • EYLÜL'DE ÇIKIYOR
KURDISTAN PRESS
Drawing: SO, 172-42 Stockholm, Sweden
Tel: (46) 8-29 83 32 • 86 47 43 TELEX: 131 42 ANK



Hevkariya Civaka

Ermeniya û Kurda

-2-

KARLANÊ ÇAĞANİ

Her wiha di derheq nêzibûna Kurda ya qenc ber bi Ermeniya de, kovara Ermeniya Araks dînivise ku "Kurda gelekî qiymeta Ermeniya digirt, vê yeka hangihîştibû wê derecê ku Kurda civat derbas dikirin û li wir Ermenî hazir bûna, qene hema Ermenî jî hazir bûna û wî Ermeniyî bi kurdi jî rind bîzânibü, disa di wê civatê de teva bi zimanê ermenî xeberdîdan."(2)

Ji niviskarén Ermeniya yekî din jî dînivise ku "Fesla teritorya (mîtiqa, axa, qada hukumkirinê n.m.) Ermenistana Tirkîyê û hevkariya Ermeniya û Kurda ya bi qirna di nav wan de xususiyetine tûsa pêde anîbû, ku ew geleki nola hevûdu bûn".(3) Helbet di nava gotina va niviskaran de ya herî rast ew e, ku ew bi qirna cîrânên hev bûn, ya ku bëftîya hukumê xweyi qenc li ser jiyanâ wan a sosyal-ekonomikîyê hiştiye û vî hukumê qenc her ku çuye kûrtir bûye.

Weki tê zanîn, di qirnê neha û deha de Kurd bere bere ber bi erdê Ermeniya de hatine, ne ku bi niyeta zeftikirînê lê rewşa wan a sosyal-ekonomikîyê ew mecbûr kiriye, ku xwe bi ciyayêd Ermeniya, mîrg û zoznêd wan, bi şînkaya pelax ve girtî bigrin, pez û dewarên xwe binin wan deran. Di vir de ya here sereke ew e, ku Ermeniya Kurda bi xweşî qebûl dikirin û hê de ser de jî mecal sazdikirin, ku ew bin-geh bigrin. Lê Kurd jî ji aliye xwe de bi hub û hezkirinekî mezin ve berbirî civaka Ermeniya bûne. Lê di piş re carna jî dagirkeran bi zordestî hukum li ser Kurda kirine, wan jî cî û warêwan wan terikandîne, birine li ser erdê Ermeniya ciwar kirine. Niyeta wan a esasî

jî bi wan re cînartî dikirin, rojêن

ew büye, ku herdu civakên cînar bera hev din. Di derheq vê yekê de akademik M.G. Nersîsan dînivise ku "Hukumeta Sultaniyê dest bi karûbarê nepakîyê dikir, ji bo tifaqdariya Ermeniya û Kurda biherifine, bi her awayî Kurda li hemberî Ermeniya radikir, bi vî awayî dijminatî di nava civakên cînar de pêşde danî..."(4)

Lê li vê yekê nenihîrî, hevkariya herdu civatan hergav kûrbû. Gundiye Kurd, wextê dihate gundê Ermeniya bêtirs û bêxof bû, aza û bêminet bû, şimkê Ermeniyê xebatkar nola bira ew qebûl dikirin.(5)

Kurd wextê dihatin gundê Ermeniya di nava demekî kin de dibûn dosta Ermeniya yê herî nêzik, tevi şîn û şayiyê wan dibûn, bi hûrmet û Qedîrgirtineke herî mezin berbirî her Ermenîkî dibûn û tu cara ferqî danetanîn nava neferê mala xwe û yê Ermeniya. Di derheq vê yekê de, rojnama Ermeniya ya Mşak wiha dînivise:"Kurd bi xey-setê(exlaq, karekter, xusûsiyet n.m.) xwe ve geleki nêzî Ermeniya bûn, hema çend salan li gundê Ermeniya bimana jî, Kurda jiyanâ xwe nolanî gundiye Ermeniya derbas dikirin; Kurda nasiya xwe didan zimanê ermenî, diçûne dawatêwan, bi kurtayî hewqas nêzikî wan dibûn, ku tevî Ermeniyan diçûn ser ziaretan. Wan ûza zelal bi zimanê ermenî xeber didan, ku tu kesfî nikaribû wan jî Ermeniya cuda bikira."(6) Divê bê gotinê, ku Ermenî jî wisa bi qedir û hurmet ji aliye Kurda de dihatin qebûlkirinê. Wan Kurden ku di gundê Ermeniyâ de diman yan jî bi wan re cînartî dikirin, rojêن

ewmandinê gîran li pişta Ermeniya bûn. Gelek malen Ermeniya, li qezayê Süldûzê, Sawucbulaxê, Miyandebê(Îran) li gundê Kurda diman. Rojnama Mşak, di derheq bineliyên(danıştwan) Ermenî û Kurd ên qeza Miyandebê de dînivise, dibêje, ku Ermeniyê ku li gundê vê qezayê belav bûbûn, bere bere, di nava salan de hînî rabûn-rûniştandinâ Kurda bûbûn, edet,kincen gelî û zimanê wan hil-dabûn.(7) Mînorskî, şahidiyê dide, ku Ermeniyê ku li Wanê diman geleki rind zimanê kurdi zanibûn, wan herwekî zimanê ermenî, zimanê kurdi xeber didan.(8)

Li ser dereca hevkari û dostañî, divê, kîrvatiya Ermeniya û Kurda bê dibiranîn, ku vê yekê ji qirna tê û tesîrekî geleki mezin li ser tekûzbûna dostañiya van herdu civakan hiştiye. Eşkere ye, ku Ermeniya û Kurda, serdaweti ji wan mirovîn ku geleki nêzikî hevdû bûn, kîş kirin. Divê bê gotin, ku Kurd û Ermenî hewqas nêzikî hev bûne, ku bûne serdawetiye hevûdu yêne wekhev. Vê yekê ji nesleki derbasi neslê din bûye. Her dê û bavekî şîret li ewladê xwe kiriye, ku vê edetê nalanî çavê xwe biparêzin.

Kurdê xebatkar, her tim baweriya xwe bi Ermeniyê gundi anîye,

şêwr û danûstendina xwe bi wî re

kiriye. Niviskarekî Ermenî, di derheq vê yekê de wiha dînivise:

"Wexta Kurda kirin-fîrotina xwe

dikirin, êvarê bi rî nediketin, li

cem Ermeniya, di mala wan de

diman. Çekên xwe didan wan da

ku veşerîn, perê xwe bê jimartin

teslimî wan dikirin ji bo ku hil-

nin, her tenê di malen Ermeniyâ

ber bi çiya de, lê hînek jî xwe di

malen Ermeniya de vedişerîn.

Di qirnê 12-an de, di salen

hukundariya malbatâ Zengîya yê

Mûsilî de, Kurd mecbûrî ber bi

Ermenistanê derin û di erdê wê yê

bakur de ciwar dibin. Li vir, ji bo

hevkari û dostañiya van herdu

civakan tekûz bive imkan tê saz-

kirinê. Di derheq vê yekê de dirok-

zanê Ermeniya G. Camciyan dînivise,

ku di qirnê 14-15-an de çîqa

diçû tekiliyê Ermeniya û Kurdan

tekûztir dibûn, ku ev jî ji derî

hîcûmkirinê hewandin û parastin

bû. (10)

(Dörm dîke)

LÊKOLÎN Û ENCAM

Di Dîroka Me De "Buyera 49 an"

Di dîroka me de gelek buyer hene ku li gor dema xwe, li gor mezinayî û buçukatiya xwe tesîren pirr an hindik li ser jiyanâ gel hiştine, ku em iro bi wan buyeran nizanîn û ji wan bêhay in. Sebebên bêhay-bûn û nezaniya me bê guman ne yek e, pirr in. Meriv di kare bibêje ku ji van sebeban yek, siyaset û hovîtiya dijmin a li hember gelê me ye. Yanî, ji bona ku em bi dîroka xwe û bi buyerên ku di dîroka me de pêk hatine, nizanîbin, ci ji desten wan hatiye kirine. Dema em bala xwe didinê, em dibînin ku ew wesiçeyen (dokumenten) ku wan rojên borî û wan buyerên ku iro ji alî me ve nayen zanîn, ronî dikin, hemûyen wan yan "îmha" kirine û yan jî gelek "baş" veşartine. Lê belê ev veşartin ji bi rengeki wisa hatiye kirine ku, ew tişten ku navê Kurda û Kurdistanê de derbas dibe û hin buyeran ronî dike xistine piş heft deriyen bi qeyd û merbendan kilit kirî û her deriyek ji heftê notirvanê har dane ber. Loma jî iro gîhandina me ya wan wesiçeyan gelek dijwar e. Lê

belê meriv, ji vê tîrsa wan, ji van "tedbirîn" wan nikare gazin bike. Dibêjin, ciyê gîlî lê, gazin ji lê, tu gîliyê me li bi dijmin tune-ye ku em gazina jî jê bikin.

Sebebêkî nezaniya me ya dîro-

kê yê din jî ev e: Pêşiyê me gelek

tîst bi xwe re birine gorê. Êdi bî

ne birine, hew ji desten wan hati-

ye, yan jî pirr ehemiyet nedanê, ev

yek ji me ve tariye. Ji ber kijan

sedemî dibe bîra bîbe, ya girîng

netice ye, ew jî tîst ji me re nehî-

tin û iro nezaniya me ya dîrokê ye.

Em pirr bi dûr ve neçin, hin buyer hene ku di nav van 3O-4O salen dawiyê de bûne, lê em car- din baş bi wan nizanîn. Û gelek kesen ku di nav van buyeran de ci girtine hîn sax in. Ev yek, ji bo fér- bûna me ya rastiyê keysek e, îmka- nek mezin e. Ger iro em wan niza- nîbin sîbê wê zane bûna wan hîn jî dijwartir bîbe. Emê di vê nivî- sara xwe de ji van buyeran li ser yekê biscekinin, buyerâ 49 an.

Wek tê zanîn, di dawîya sala 1959 an de (17/12-1959) 49 ronak- bîren Kurd hatin girtin. Loma jî

ev buyer bi navê "Buyera 49 an" tê bi nav kirin. Esas ne 49, 4O kes hatin girtin û 9 kes jî ji derve meh- keme bûn. Sebebê vê jî ev bû, zîn- dana lê hati bûn kom kirin (Har- biye) bes tê de ciyê 4O kesi hebû, ciyê 49 kesan tune bû. Loma jî buyer, buyerâ 49 kesan bû, lê yêna- hati bûn girtin 4O kes bûn.

Sebebê Girtina 49 Ronakbîren Kurd

Di esas de tu sebebekî "huqûqi" û berbiçav ê girtina wan tune bû. Bê sîc û bê delil 4O Kurden ronakbîr civandibûn û avetibûn zîndanê. Lê çîma û ji bo çi? Ji bo çi dixwestin 49 Kurden ronakbîr bikşînin ser darê sîpiyê, yan jî bi kîmasî ceza bikin? Me li jor jî got, di desten wan de tu delîkî berbiçav tune bû. Lê bes tiştek gelek diyarbû, îstîxbarata (MîT) wan dixwest ku van 49 kesan mehûm bikin, ya girîng û berbiçav ev bû. Bes beri girtina 49 an rojnameva- nekî bi navê Abdurrehman Efem Dolak li ser tuxûbî Iraqî hatibû

Zinarê XAMO

girtin. Digotin ku vî rojnameva- nî ji van 49 kesan navê hînekan daye, gotiye ez wan nasdikim. "Sûc" û delîkî berbiçav ê girtina wan ev bû, Abdurrehman Efem Dolak ji wan kes nas dikir. Lê ev naskirinek jî bes nas kirinek şex- sî bû, tu tekiliyê siyâsi û nabêna wî û tu kesi de tune bû. Evêya mane bû û tu carî jî kela mana tije nabe. Lê belê ev girtin ji bin de jî ne bê sebeb û bê armanc bû, tu bîbê nebê armancek vê girtinê hebû. Ü ev jî sebebekî siyâsi bû. Gelo çi bû ev sebeb?

Di dema girtina 49 an de Partiya Demokrat (DP) li ser hukum bû. DP, zulm û zorek ne dîti li gel dikir. Rewşa gel him ji aliye abo- ri de û him jî ji aliye siyâsi de her ku diçû xerab dibû. Bê guman vê yekê jî, DP ji çavê gel dixist û muxalefeta li dij DP jî zêdetir dikir. Pişti hilbijartina sala 1957 an DP gelek ji hêz de ket û CHP (Partiya Cumhûri a Gel) ji gelekî xurt bû. Lê belê DP cardin li ser hukum ma bû. Rewşa gel her ku diçû ber bi xerabiyê de diçû. Xwendevan

Bîrantiñen Generaleki

Tîrk

Cemal Madanoğlu
Wergêr : Alîşer

-2-

Min pirs kir:

-Çi bi lingê te hatiye?

Bersiv da:

-Do, li Newala Cehenemê, kamyon me dan sekinandin. Alba- yek hebû, li wî xistin, kamyonê şîlandin û di wê navê re gulek jî li piyê min ket... Tiştên wiha dibin, ne zêde giřing e... -Eee!... Newala Cehenemê li ku ye?

-Hinek li pêşîya me ye...

Min dest bi melhezê kir.

Lê ger cardin ew mehkûm bê? Çar-pênc kes, çaralî der û dorê kamyonê bigrin, ez kesek tenê, ezê ci bikim? Devança min heye, ez di ber xwe de nedim dê min ji bişîlinin; bi taybeti dê çekê min ji min bistîlin. Ez herim taburê, ezê bu ci rûyî bêjim "mehkûman devança min ji min stend"? Dê ev han li min giran bê... Ez diqîqlîlim.

Car carinaz ez dizivirrim û ji miawinê şofêr re:

-Em gihiştin Newala Cehenemê?

-Hê heye.

Di paşwextekê de, mirov:

-Va em dikavin Newala Cehenemê, got.

Bi berjêri em dadikevin.

Li der û dorêne me darêne ber hene.

Darân berû yêne kortik.

Ciyekî bi sî.

Em ketin gelî.

Cardin em bi berjor bûn û gihiştine rastekê. Kamyon di rastê de dest bi domandina meşa xwe kir.

Piştî ku me pênc deşîqan rî domand, min lê nêri, di pêş de çar-pênc mirovîn fistan sişî. Bi nêzibûna kamyonê ve xweşîr hatin xûyakirin. Mirov bi çek in. Em hînek din nêzî wan bûn. Ez bi ser bînbaşî de fetîlim:

-Ev kî ne bînbaşî(sergurd) min?

Şêxmus efendi:

-Tu li min nenêre, ez ji aş hatime û ard pekiyaye ser çav û rûyê min.

Yanî?

Ez wisa dixûyêm, lê, ne bi imr im, dibêje... Ji bo seroktiya xwe ya Komela Xortan bipejirîne.

Min lê nêri mirovîn tînâker e, min ji dest pêkir, car carnâne pê re henekan kir:

Bi "Ruhê Ataturk re" Hevpeyvînek

Hûnê bibêjin ma bi miriyen re ji hevpeyvîn dibe. Bi rastî di serî de me ji bawer nedikir. Lê pişti ku rojnamak Tirkî ku li Almanya derdikeve hevpeyvînek bi "ruhê Ataturk re" çekir û weşand û Necla Çarpan a nivîskar ji bi "ruhê Ataturk re" peyivî û li ser vê peyivan-dina xwe "sê pirtûk" nivîsand û van pirtûkên wê ji ji alî Wezîrê Hindekariyê ve wek "çavkaniyek" girîng hat qebûl kirin, edî me ji mecbûri "bawer" kir. Erê me ji "hevpeyvîna bi ruhê Ataturk re" bawer kir, (!) lê li alî din ji me ji hin gotinê ku li ser navê Ataturk hati bû gotin qet bawer ne kir. Hûn rastiyê bixwazin, me ji "tezwîratekê" şik dikir. Loma ji a rast ew bû ku me raste-rast bi ruhê Ataturk re hevpeyvînek çekira û ditinê wî ne ji "der û dora", bîzatîhi ji devê wî bîbihîsta. İcar pişti "hevpeyvîne" me dit ku ew şika me geleki di cî de bûye.

"Frekans eyar bû, pêwendî hat danîn", me ji Ataturk pîrsî:

- Tu rewşa Tirkîyê çawa dibîni?
- Ez rewşa Tirkîyê gelekî baş dibînim, hukumetî bi dil û can daye ser şopa min. Hûn jî bizani bin, di sala 1923 an de li Îzmîrê, min "Kongra Îzmîrê a Îktisadî" civandi bû. Di wê kongrê de min bingehê siyaseta iro avêt. Tirkîye li ser riyek rast e.

- Li gor te kî Tirkîyê idare dike?
- Min ji kî re hiştibû ew idare dikin.

- Dîtina te li ser pêwendîyên Tirkîyê, NATO, Banka Dinê û IMF ciye?

- Welle di saxiya min de van navana tune bûn, lê bi qasî ku ez dizanim vana "muesesên" ji alî dost û hevalbendîn me de, ji alî "Dinya Rojava" ve hatine ava kirin, wê demê gotin jê re tune-ye, gişen wan ji baş in.

- Evren got ku "ezê Makzagô-nê -Anaya- bi kesi nedim qul kirin, ditina te li ser vê yekê ci ye?

- Camêr baş gotiye, lê kêm gotiye. "Nedim kul kirin" ci gotin e, dibê nehèle xumamî lê venije.

- Gelo li gor te Reagan merive-kî çawa ye?

- Li gor baeriya min pişti Truman gelê Amerika cara pêşîn e ku serokekî pir mezîn û hêja dibîne. Ez dibêjîm, heger ku ew tune ba nuha komînîzmî dinya dabû ber xwe. Û ji bona ku komînîzm ji ruyê erdê rabe, dibê her kes piştgiriya siyaseta Reagan bike. A bixêr Turgut û Evrenê min bi vê daxwaza min dizanîn û li gor wê siyaseta xwe dîmeşîn. Ez bawer dikim we yê ji bir nekiri be, min xwesti bû li Tirkîyê koka komînîzmî bîqelînim, lê felekî ne hişt îcar Reagan dixwaze komînîzm ji tevaiya cîhanê rake, ev ji wî dîke serokekî gelek mezîn.

- Evren û Turgut Ozal dibêjîm li Tirkîyê demokrasî heye. Gelo tu ci dibê?
- Rast gotine, heye. Lê bi bawerîya min pirr zêde ye ji. Hûnê bibêjin ciye? Ez dibêjîm: Dema polisek ya ji leşkerekî me "xayînekî" bîhemdî dikuje, him li deê welêt û him ji li hundurî welêt hînek kesen "xwe nezan" bi navê

- ronakbîriyê li dij derdikevin, dibêjin bira "musebîb" bîn girtin û mehkeme bibin. Parlamenteñ Ewrûpî di bin xêliya maf û azadiyên insanî têni li girtîgeha digerin, bi malbatên girti û kuştîyan re dipeyivin, li ser hebûn û tunebûna demokrasiyê lêkoloña çê dikin, rapora hazır dikin. Û berpirsiyârên dewletê ji, ji bona xatirê demokrasiyê tiştekî nabêjîn, nikarin bibêjin. Ev tiştên ne xweş giş, li ser navê demokrasiyê û ji bona xatirê demokrasiyê têni kirin. Ma di dema min de wa bû, ji bayvê kê zêdebû ku tiştên wisa ji me bipirsiya û em mehkeme bikiran! Ezê minakekî bidim: Di Serihildana Koçgîrî, Şêx Seîd, Sason û ya Agîrî yê de ne yek û dudu, bi hezaran insan hatin kuştîn, kê dikari bû bigota çîma hûn dikujin, ya ji doza mehkeme kirina "musebîba" ji me bikira? Û ên kirin ji hûn dizanîn me ci anî serê wan.

- Te di saxiya xwe de carê goti bû "efendiyîn welêt gundi ne" gelo nuha tu ci difikirî?

- Erê wê demê wer hewcubû min wer got, lê min tu carî ne wer qebûl kir û ne ji xwest ku gundi bibin "efendiyîn" welêt. Min ne erd li wan belav kir û ne ji daristan. Çawa ku "Kecîka qereçî nikare bibe xatûn" her wisa gundi ji nikarin bibin efendi. Ma dema gundi ji bibin efendi, ê le kî yê bibe gundi?
- Di derheqî işkencê de ditina te ciye?
- Ço (dar) ji cinetê derketiye, dewlet bê işkence idare nabe.

- Serokê Partiya Milliyetçi a Xebatê Ali Koç dibêje "serokê me manewî Ataturk e" tu ci dibê?

- Hemû kes dizane ku ji bona "Tirkizmî" ci ji destê min hat min kir. İcar kî bibêje Tirkek beramberî (bergendi) cihanê ye" ez serokê wan i manewî me.

- Dibêjin li Stembolê dikin kerxanak Ewrûpâyê ya herî modern çê kin, ma tu dibê ci?

- Wê di nizamek kapitalist de van tiştana ji hebin. Nişana hebûna "demokrasiyê" ye.

- Hinek "kes" û "hêzên" çep li te û siyaseta te xwedî derdikevin dibêjin Ataturk merivekî li dij emperyalizmê bû. Ditina te ciye?

- (kenekî dûr û diref) Buh-tana li men dikin. Ü him millet û him ji xwe dixapînin. Ma ew nizanîn ku min gotiye "komînîzm li ku hat ditin dibê serê wê bê pelçiqandin. Em bibêjin bi viya nizanîn, ma "Behra Reş" ji nayê bîra wan. Mesela li dij bûna emperyalizmê ji, ji ber xwe derxistine.

- Pirsa dawî. Dîtina te li ser Kurda ciye?

- Baş bû ku we ev pirsa kir. Wek tê zanîn, jiyana min qîm ne kir ku ez dawiya wan bînim u Tirkîyê bi carê de ji vê "belayê" xelas bikim. Lê ez hêvî dikim ku wê Evren karibe vê armanca min bi ci bîne û me û zarokên me bi carê de ji Kurda pak bike. Axx... axx... ka ew roj!
- "Bay" Ataturk, em ji bo vê hevpeyvîne, sipasî te dikin.

Xwendevanekî ji Stockholmê

baş bûye. Alikariya hev kirine, xwedî li hev derketine. Ya girîng ji wê demê di nav xwe de komun ava kirine û ci tişt û perê kê hatiye teslimî vê komunê bûye. Yê perê wî hebûye daye û yê perê wî tune bûye ne daye. Lê her kesî li gor hewcedariya xwe girtiye. Bê guman ev ji hevkariyek baş bûye.

Rewşa Girtîgehê û Têkiliyên 49 an

Hemûyên girtiyan li Stenbolê di girtîgeha leşkerî Herbiyê de hatin kom kirin.

Di girtîgehê de, -ku ji van odan re "hucrîn mirinâ" dihat gotinli girtîyên Kurd gelek neheqî hat kirin, işkence û eziyet bi wan didan kişandin. Li ser vê yekê Dr. Şivan wisa dibêje: "Di dema tecritî de, bi meriv û abûqatân girtiyan re tevî bi yek benderuhekî re ne hiştin hev û du bibîn -bêl ale-tê zûlm pûlisân - û di hucreyên ku ji bin de bê ronî, bi rutûbet, her derê wan di nav kufukê û sar û her yekê wan bi qasî tîrbekê de hatin girtin. Bira weşanên rojane li alîkî be, lê ne dihiştin ku ew weşanên di derheqî sin'etên xwe de ji bixwînîn.

Di meha 4 an ya vê işkencâ modern de, xwendevanê Unîversîta Anqerê a Huquqê EMİN BATU ê Mêrdîni ji serma bi saetan xwîn versîya û pişti ku kes ne hat gaziya wî, şehîd ket." (Dr. Şivan, Kurd Millet Hareketleri ve Irak'ta Kurdistan Ihtilali, rûpel 108). Ev mînak ji nîşan dide ku hêzên kevneperest li hember ronakbîren Kurd çîqası har û wahş bûne.

Lê li alî din li gor infor-masyonen ku me kom kir, têkili û hev-kariya di nabêna hemû girtiyan de

WEZARET Û EDALET

Li Londonê di ziyaret resmî de, Serokwezîrê Tirkîyê Turgut Ozal cû ba konsolosê İsvîçrê. Pişti çend gotinê ji der û doran, ji konsolos re got:

"Min meraq kir, her çiqas gemîyek we ya herbê tuneye ji, lê wezareta we ya behrê cardin heye. Gelo ciama?"

Konsolosê İsvîçrê di bin simbêla re keniya û bersîva T.Ozal da: "Dostê min û delal, lê li ba ba we ji her çiqas edalet tuneye, lê Wezareta Edaletê cardin ji heye. Ma ne wisa ye?"

HEQÎ Û NEHEQÎ

Rojekê Hedî û Neheqî dîbin heval û bi rî de diçin. Merîvê rîwî zû birçî dibe, Neheqiyê gote Heqiyê, go:

- Pere li cem te hene, em herin nan bixwin!

Heqiyê go: -Welle li cem min tune.

Neheqiyê go: -De tişt nake, em herin.

Çûn aşxanê ku nan bixwin, ji xwediyê aşxanê re gotin:

- Nan bîne.

Nanê xwe xwarin, ji xwediyê aşxanê pirsîn, ka qîmetê xwarinê ci qas e?

Got: Panzde banknot.

Neheqiyê destê xwe bir bîrka rastê, bîrka çepê, xwe gîro kir. Rêwikî din got:

-Xwediyê aşxanê, were hesabê min dade(bigre), li min dereng e.

Xwediyê aşxanê ecêbmâyî ma, go:

Te qe hesabê xwe nedaye, perê teyî hûr ji ku bê?

Xweyê aşxanê dît çare pê nabe, go:

-E, heqîya Xwedê tu li kuyî, deng naki?

Dilê heqiyê debar nakir, go:

-Welle, ez ne dûr im, lê me tevî hev xwariye, newêrim xeberdim.

XEBAT PAREVEKIRIN

Rokê jinekî gazinê xwe ji mîrê xwe kir, got:

- Tu qe ali min naki, giranya malê bi temamî li ser sitûyê min e. Heta êvarê dixebeitim. Sibê zû radibim, dewar-mewarê malê alif dikim, cî-miya hildidim, paşê xwarin-marîn hazir dikim, kinc-mincî qirêj dişom. Ji berbanga sibê rehetiya min tune: Hevir-mevir dikim, nan-man dipejim, pez-meze malê didoşim, kes tune alî min bike, tu ji bi kîfa xwe digerî, qe na bêji hema bi tiştekî ez alî jina xwe bikim.

Mêrê jinikê fikirî, hilda got:

-Evda Xwedê, welle gîlyê te rast e. Hema ji îro şûnde xebata malê, emê bi helalî nîvî kin, nîvî tê bikî. nîvî ji ezê bikim.

Jinikê got:

-Çawa?

Go:

-Sibê zû emê rabin, tê dewêr alif bikî, ezê ji mewêr alifkim, ciya tê hildi, miya ji ez, hevir tê bikî, mevir ez, xwarin tê hazirkî, marinê ez, kincê zarokan tê bişoyî, minca ez, nan tê bipêji, man ez, pezê malê tê bidoşî, mez ez. Ji vê şûnde her tişti emê nîvîkarî bikin, bira barê te hinkî sivik be. İdî gazinê te ji min tunebe.

bêtir diyar bûn, pêşve çûn.

20- Yaşar Kaya

21- Faik Savaş

22- Haydar Aksu (abûkat, mir)

23- Ziya Acar

24- Fadıl Budak

25- Halil Demirel

26- Ferit Bilen (tacir, mir)

27- Mustafa Direkçigil

28- Feyzi Avşar

29- Hasan Ulus (mutahît, mir)

30- Nazmi Balkaş

31- Huseyin Oguzçok

32- Mehmet Çidem (dekorator, mir)

33- Fevzi Kartal

34- Mehmet Aydemir

35- Abdurrahman Efemadolak

36- Musa Anter

37- Canip Yıldırım

38- Emin Kotan (hostê elektrîk, mir)

39- Okçeş Karadag

40- Muhsin Şavata

41- Turgut Akîn

42- Mustafa Ramanlı

43- Mehmet Ozer

44- Feyzullah Demirtaş

45- Cezmi Balkaş

46- Halis Yokuş

47- Ismet Balkaş

48- Nurettin Yılmaz

49- Husamettin Koran

Polîsê Tirk in An Jî Ajanê Amerîka ne?

Ji vî bi çendekî berê ifadênu welatparêzên Lîbîyayî di Mehkema Ewlekarî ya Dewletê ya Tirkîyê de li Anqerê hat sitendin. Eli Remezan Ecefîlî û Recep Muxtar Erhûma Tarhûmî, bi îdea êrîşek li dijî Kulûba Zabitê (Efserê) Amerîkî ya li Anqerê, hatibûn girtin. Di dema girtimayina xwe de gelek t'ade kişandin, işkence dîtîn. Di mehkema rejima faşist a Tirkîyê de ji bo van welatparêzan 20 sal ceza tê xwestin.

Ji her du welatparêzan ê bi navê Eli Remezan Ecefîlî di mehkemê de wiha got: "Ez bi turîstî hatibûm Tirkîyê. Ez van tiştîn ku di îdeanamê de ne, qebûl nakim. Li wela-tê me maşenîn têna biciyanîn. (...) Li min işkence kirin. Ez dix-wazim hûn min bişinîn doktor. Ü kesen ku li min işkence kirine, di derheqê wan de jî dixwazim tah-qiqat bê vekirin."

Recep Muxtar Erhûma Tarhûmî, gotinê hevalê xwe tesdiq kir û peyva xwe wiha domand: "Ev kesê hemberî me eger ku mide-am (savci) be, dema li me işkence dihat kirin ew jî li vir bû. Ev mideamekî çawa ye? Min bi tena xwe birin odekê ku ala Amerîka lê daleqandî bû, ü li vir ifade min

sitendin. Demekê jî çavê min gitibûn. Vêga van kesen ku li vir in polîsê Tirk in, an jî ajanê (casusê) Amerîka ne. Ez dixwazim di der-heqê mideî am de tehqîqat bê kirin."

Piştî van peyvan, mideam Ulku Coşkun dest bi derewan (virran) kir û got "Di hundurê ku ifade têde hatin sitendin, bi tenê ala Tirk û xarita Tirkîyê hebû."

Her çiqas armanca vê gotina wî ew bû ku xwe rûsîpî derxe jî, bi vê gotinê mideam "uzrekî ji qebar-hatê mestî" kir.

Bi rastî vê gotinê nîşan da ku di dema işkencê de li işkence xanê (zîndanê) bû.

Vî tiştî hanê carek din rastiya baweriyeñ me yên li ser rejima faşist a Tirkîyê da ber çavan û tu şik ji van baweriyan re nehiş, Tirkîyê bi aborî, siyaset û leşkeren xwe ve girêdayî Amerîka ye, xulam e.

Diktatoriya faşist bi alikariya Amerîka li ser piyan disekine. Kapitalistên (sermiyandarê) mezin ên ku dixwazin faşizmê ne, ji Amerîka ra deyndar in, bi saya Amerîka bêtir gelan -zêdetir jî gelê Kurd- dipelçiqinin, xwîna wan dimêjin.

Ewê cîma faşistîn Tirkîyê ala Amerîki li işkence xanê xwe yê bi xwîn daneleqinîn û ajanîyê (casusî) ji Amerîka re nekin?

Ozal: "Zem bînin ser buhayê metro yê"

Her kes dizan e, Turgut Ozalé Serekwezirê Tirkîyê bi zemdarîya xwe nav û deng daye. Hema cî lê teng bibe, pere jere lazim bibin, zemê tîne ser buhayê tiştekî. Loma jî li Tirkîyê û li Kurdistanê, roj tune ku zem neyê ser malekî.

Lê xuya ye Turgut Ozal bi vê yekê têr nabe dixwaze "eqil" bide welatîn din. Demek berê ji bo xurtkirina peywendiyeñ aborî û ticarî bi heyetekê ve çûbû Roma-nya. Di navê re, carekê wî li nav

bajarê Bukreş jî gerandin. Turgut Ozal li metroyê jî siwar bû. Lî gava bihist buhayê siwarbûna metroyê "leyek Romanî" ye, ji guhê xwe bawer nekir û neket serî ku çîma hewqas erzan e. Dawiyê li Romeniya vege riya û got: "Hewqas erzan nabe, divê hûn zemê bînin ser buhayê metroyê". Romeniya di bin simbelan re keniyan û gotin: "Ev ne karê me ye, lê yê dewletê ye".

Parlementerê Awrûpi Li Girtîgeha Diyarbekir

Roja 18 ê Hezîranê, Serokê Komîsyona Siyasî ya Parlamento-ya Awrûpa Klaus Hansch û Serokê Grûba Sosyalist a Parlamento-ya Awrûpa Ludwig Fellermaier çûn Diyarbekir, serî li girtîgehê xistin. Di girtîgehê de bi gelek girtiyan re axîfîn. Bişî ziyaretê dele-gasyonê civînek bi rojnameyanan

Destpêk r.8

HEVPEYIVÎN...

hînek malûmat bîdi ?

MALMÎSANIJ: Dirbareya Kur-diya nivîsandi ya pêşin çend bîr û ray hene. Mesela hînek kes şîrîn Baba Tahirê Uryan(Hemedanî) kevntirin berhemên edebiyêñ Kur-di qebûl dikan. Ev şîrîn Baba Tahir di sedsala 11-an de bi lurrî hatine nivîsin. (Diwana Baba Tahir li Iranê çend caran hatîye çapkirin. Ji vana yek, digel pêşgo-tina Reşîd Yasemî ye). Hînek kes, Lurrî ji zimanê Kurdî nahesibîn. Ez bi xwe, ji ber ku Lurrî nizâ-nim, di vî warî de nikarim tiştekî bibêjim.

Bi qasî ku tê zanîn hînek kevntirin berhemên Kurdî bi zaravê Goranî(Hewramî) hatine nivîsin. Edebîyata Goranî, piştî sedsala 14-an bi Mela Perîşan û paşê bi şai-rêñ wek Bêsarani, Mewlewî Tay-gowzi û Sey Yaqû dewam kir. Ji vê zaravê edebiyateke klasik i dew-le-mend maye.

Piştî zaravê Goranî(Hewramî) di sedsala 15-an de bi Kurmanciya bakur jî berhemên edebî hatine nivîsin. Kevntirin şairîn Kurmancî ku tê naskirin Melayê Cizîri, Eli-yê Herîrî û Feqîye Teyran in. (Li gor hînek nivîskaran, ev şairîn Kurmancî hîn kevntir in).

Herçî bi Kurdiya başur(Mukrî, Soranî) edebîyata nivîsandi di sed-sala 19-an de destpêkir. İro ev zara-vaji ali zimanê nivîsandiye de zara-vê Kurdi yê herî pêşdetir e.

Wekî min li jorê jî got, bi qasî ku ez dizanîm berhemên edebî yên nivîsandi yên bi zaravê Dimili(Zazakî) di 1898-an de destpêkir. Lî, heta iro edebîyata nivîsandi ya

re kir. Di civînê de hat gotin ku "li gor girtiya daye beyan kirin ev her du salêñ dawîn işkence fiziki nayê kirin, lê bi hin awayen ditir ev işkence têñ domandin. Destûr-nedana mirovîn girtiyan ku bi girtiyan re Kurdî bi axîfîn, li dijî Bey-annama Awûpa ya Mafêñ Mirova-tiyê ye".

Destpêk r.8

Malmisanij

ku ziman nasanî me li ser van meseleyan bi dûr û dirêji bise-kinin. Em dixwazin derheqê dahatûya zimanê kurdi de tiş-teki bipirsin. Gelo bi ditina te yekîtiya zimanê Kurdî wê cawa pêk bê ?

MALMÎSANIJ: Ev mesele bi serxwebûn û yekîtiya Kurdistanê ve girêdayî ye. Wê çaxê wê zara-vayek wek zimanê resmî bê qebûl-kirin û zaravê din jî wê jê re bibin alîkar. Digel vê, her zarava dîsa hetâ demekê di mintiqâ xwe de wê bijî. Lî, li ser dirêjahiya vê demê ji nuka ve mirov nikare tiştekî bibêj, ji ber ku ziman bi prosedu-ra xwe ya tebî ber bi pêş diç. Heta ku şertîn wê pêk neyîn yekîtiya zimanê çenabê. Bi zorâñ an jî bi daxwazîn şexsi, ziman ne pêk tê û ne jî têk diç. Divê ku em reali-tê ji xwe re wek bingeh qebûl bikin û li gor wê tiştîn ku ji destê me têñ bi awayekî zanîstî bi cih bînîn.

A yekem, heta ku ji dest tê divê her zarava bi tevî dewlemendîya xwe bête nivîsandin, strukturê wan ji ali gramer û lenguistik ve derkevin rastê û ev zaravana ji her ali ve bêñ muqayese kirin, ciheti û aliyan wan yên müşterek bêñ tes-bit kirin. Di pê re ji divê mirov giraniye bide ser xusûsiyeten wan ên müşterek û termînolojîyek müşterek qebûl bike.

Bi kurtahî, ji bo yekîtiya ziman tenê daxwaz û niyet têr nake, zanîna metoda xebatê hîn girêng e.

ARMANC: Çendek berê kitê-bekekî te bi zimanê Tirkî derket: Di Destpêka Sedsala 19-an de Nasionalizma Kurd û Doktor Abdullah Cewdet. Ev kitêb, netica lêkolînek dîrokî ye. Gelo têkili û bilibûna te ya bi dîrokê re, ji ku tê ?

MALMÎSANIJ: Gava ku mirov li Tirkîyê mensubê miletékî bindest be û bi taybetî Kurd be, bix-waze nexwaze tarîxa miletê xwe meraq dike. Çimkî karbîdesten dagîkeren Tirk, siyaseta xwe li ser iddia tunebûna Kurdan ava kirine. Li Tirkîyê jîli Tîrkan miletékî din jî heye, ku miletékî Kurd e. Wek

Li ber çavê gele Kurd û Tirk û li ber raya giştî ya derveyî welat tu sâceki İsmail Beşîkçi tune. Ew alimeki hêjâyî bi şeref e. Xwwedî ramanweriyeke bilind e. Loma jî rojek zûtir divê bê berdan.

Wekî gelek Kurdîn din min jî ci

Mensûbêñ EÎD Bi Sûcê Kurdayeti û Cudaxwazî Têñ Mehkeme Kirin

*Li gor hakîmê Mehkema Tirk, mensûbêñ EÎD (Enstitûya İstatistikî Ya Dewletê) propaganda Kur-dayeti û cudaxwaziyê kirine. Di nabêna 5 û 8 salan de hukum ji wan re tê xwestin.

Ji bo hejmartinê nifusa Tirkîyê ya giştî (en 1980 û 1985-a) Enstitûya İstatistikî Ya Dewletê, ji bo memûrîn ku wê herin li mala nifûse bijmîrin, broşûrek li ser rîn-şandana awayen jîmartînê de hazir kirin. Kesen ku vê broşûre hazirkirin ku digot ji bilî zimanê we yê zikmakî yê tirkî, hûn ci ziman zanîn * Li rex wê jî hin alternatif wek; "îngilîzî, fransîzî, erekî, kurdi" hatibûn nivîsandin û hatibû gotin ji yekê jî van binivîsin. Li ser vê yekê, bi idia "ji navê rakirin û zeftîkirina hesten(hissîn) millî" dawe di derheqê van 11 kesan de hat vekirin. Li gor Mud-

deâmê Ewlekarî ya Dewletê, yuzbaşı Ulku Coşkun, "Her çiqas Kurdi lehcek zimanê Tirkî ye û ne zimanekî serbixwe yê navnetewiye, van kesan cih nedane devokê Tirkî yê û navnetewiye." Mideam(sawcî) dibêje, ku van 11 kesan bi vê yekê propaganda Kur-dayeti û Cudaxwaziyê kirine, loma jî divê di nabêna 5 û 8 sal bi hukmê zindanê bêñ cezakirin.

Destpêk r.1

TIRKIYE JI DEMOKRASİYÊ DÜR E

ya xwe ya dijî vê semînerê bi van peyvan diyar kir. "Li Tirkîyê emê demokrasiye damezrîn û bidin jiyandin. Bi mudasaleyeñ derveyî tiştek havîl nabe" û bê dil di semînerê de besdar bû.

Di semînerê de, serekê Sendika Nivîskarêñ Tirkîyê Aziz Nesin, ditinê xwe yên li ser rewşa siyasi ya Tirkîyê wiha diyar dikir; "Li Tirkîyê rewşa ronakbiran dişibe rewşa dizên sabiqekir. Çawa ku dizên wiha ji bo ku zivistanê di girtîgehê de derbas bikin can davên, em ronakbirêñ Tirkîyê ji xwezî din, ku mehkomik hebûna, ku me dengê xwe bida bihîstin. Ji ber ku ji 12-yê ilona 1980-an vir de bes em dikarin di mehkeman de biaxîfîn.

Li gor hînek ronakbir û kesen siyasi yên Tirkîyê, ku mirov rewşa Tirkîyê ya hundîri bi derive bide xwiyakirin ev dice bêserefi. Lî, meselen Tirkîyê yên aborî(ekonomî) û leşkerî(eskerî) hemû di bin kontrola biyaniyan de ne. Bi ya van ronakbir û kesen siyasi, ku yekî biyani were Tirkîyê û bê;

SERÊ NAVBERA RONAHÎ Û TARÎTIYÊ

Destpêk r.1

Loma jî ji sala 1971-ê vir de jiyana İsmail Beşîkçi, li qereqolan, li mehkeman û li zindanîn derbas dibe. Ji 30 salî zêdetir hukmê zindanê jê re xwestin û lê birîn. Heya niha sê caran kete zindanê. Jiyana wî ya zindanê jî yanzde salan dibuhure. Bes ji bo namekî 10 sal ceza danê, hîn jî di zindanê tarî de ye. Lî xeyala karbîdesten tarîtiyê nebû rastî. İsmail Beşîkçi, dev ji baweriya ilmî berneda, rûyê xwe ji ronahîya dinya rastîn neguhart, meş'ala destê xwe li qereqolan, li mehkeman û di zindanîn de pêxisti hiş. Bi şeref û mîrxasîyê êrîş bir ser tariya reşxenî. Ewî bas zanîbû, ku ev ser serê ronahî û tariye ye. Loma jî xwestî li ronahîya derket û get gave-ke jî paş de neavê. Ma jî vê bi rûmettir û mestir ci heye

İSMAİL BEŞİKÇİ

Destpêk r.1

mîrxaşî bîr û baweriyeñ xwe yên li ser daw û doza Kurda parast. Mudafaenama wî, li kursiya mehkema faşist a Tirk bû parasin û daxwaznama mîletê Kurd. Bû sembla şeref û namûsa alîmiyê, demokrati û mirovperweriyê.

Dr. İsmail Beşîkçi, ne mîrkuj e. Ci Tirk ci Kurd ne endamê tu partiyeñ nehîni(dizi) ye jî. Bes alimek e, nivîskar e, ramanwerîkî ronakbirî demokrat e. Ne Kurd, Tirk e. Lî çima dibêje û dînivîse ku; Li Tirkîyê ji bili Tîrkan mîletékî din jî heye, ku mîletékî Kurd e. Wek

Li ber çavê gele Kurd û Tirk û li ber raya giştî ya derveyî welat tu sâceki İsmail Beşîkçi tune. Ew alimeki hêjâyî bi şeref e. Xwwedî ramanweriyeke bilind e. Loma jî rojek zûtir divê bê berdan.

"Berew berzayî deçim gerçî wurd im, Xaki ber pêy têkoşerîkî Kurd im."

HEVPEYIVİN

Malmîsanij:

”Ronakbîr ew e ku mêtî û roniya çavê xwe ji bo menfeeta gelê xwe û însaniyetê bikar tîne,,

ARMANC: Ji bo xwendevanen me, ji kerema xwe tu dikarî xwe bidî naskirin ?

MALMÎSANIJ: Zarokîya min li gundekî Kurdistana Bakur derbas bû. Min xwendina xwe li bajarekî rojavayê Tirkîyê temam kir. Pişti xwendina xwe ez vegeiyam Kurdistanê û li çend bajaran xebitîm. Ev serê çend salan e, ku li Awrûpayê me.

ARMANC: Bi qasî ku em dizanîn li ser ziman û kultura Kurdi xebata te heye, gelo te kengê dest bi vê xebatê kir ?

MALMÎSANIJ: Weki min got, pişti xwendinê ez vegeiyam Kurdistanê, wê çaxê yanê di 1974-an de min dest bi xebata li ser ziman û kultura Kurdi kir.

ARMANC: Tu dikarî bi kur-tî ji me re qala vê xebata xwe bikî ?

MALMÎSANIJ: Di 1977-an de kitêbek li ser tarîxa Kurdan ku min wergerandibû, çap bû. Berî 1980-yan li Tirkîyê, di çend kovaran de hinek nivîsan min ên der-heqê ziman, folklor û kultura Kurdi de derketin. Di pê re li Awrûpayê jî di çend kovarîn kurdi de min hinek nivîs û şîrî nivîsi. Ji ali-yê din de jî ez li ser ferhengeke Dimili (Zazaki)-Tirkî dixebeitim. Ev ferheng 1984-an de temam bû. Lî hê çap nebûye.

ARMANC: Li Tirkîyê ji ber xebatê xwe te qet dijwarî dît ?

MALMÎSANIJ: Îzeh kirina van dijwariyan ne hêsan e. Ji bo têge-hiştina dereca wê divê mirov Kurd be û li Tirkîyê bijî. Weki gelek Kurdîn din ji van dijwariyên hinek jî para min ketin. Ji ber xebatê xwe, di heqê min de deh mahke-me vebûn, pênc caran jî ketim hepsê.

Di vê derê de tenê ez mîsâleke didim: Min çend şîrîn Nazim Hikmet, Ahmed Arif û Huseyîn Ferhad wergerandibû Dimili ku di hinek kovaran de derketibûn. Rojekê eskeran avêtin ser mala me û şîreke Ahmed Arif ku min wer-gerandibû Dimili dîtin. Dema ku ez di hefsê de bûm, di mehkemê de li gor ”sawçî” ev şîr jî yek ji ”sûc belgelerî” bû. Lî mahkemê demek dirêj tercûman an ”bilirki-şî” nedîtin, ku ji vê şîrî fêm bikin. Ewîli gotin Kurdi ye, paşê ji ber ku jê fêm nekiribûn, gotin; ”dibe ku bi zimanî Êrmenî be”. Dawi-yê hat fêmkirin, ku Dimili ye. Vê carê jî nikaribûn tercûmanekî peyda bikirana, ku jê fêm bikira. Li dawiya dawiyê ”tercûmanek” Dimili(Zaza) dîtin, ku ”gece bek-çisi” (bekçiyê şevê) bû. Ev bek-çiyê ”tercûman” ji gundê Himbê-lê bû. Bi emrê serekê mahkemê ku komutanekî leşkerî bû, ev şîr jî ali bekçî ve hate ”tercûme” kirin. Bi vî awayî li dinê cara yekemîn bû, ku bekçiyekî helbestek ”tercûme” kir û axirê hat fêmkirin ku di vê şîrî de ”sûc unsuru” (delîl sûcê) tuneye.

Fermo ji we re li Kurdistanê komediyej trajik.

ARMANC: Tesîra politika asimîlasyonist a Tirk li Kurdistanê li ser ziman û kultura me cawa xwe nîşan dide ?

MALMÎSANIJ: Ev yeka bi kur-tebirî tofanek e. Ji bo izehkirina wê, bi dehan kitêb bêñ nivîsin jî qîm nake.

Bingeha vê politika karbidesten Tirkîyê înkarkirina Kurda ye. Armancâ wan ji ortê rakirina Kurd e. Mesela, li dînyê tenê li Tirkîyê mirov nikare bi dîlê xwe navekî li zarokê xwe ke. Ji ber vê politika wan a hov, kultura me ber bi deje-nerebûnê û deformebûnê diçê. Daxwaza wan ew e ku bi darê zorê me bêşexsiyet bîhelin da ku ji tir-san em piçûk bibînîn û xwe înkár bikin. Tesîra vê politikayê bêgu-man li ser xelkê kêm û zêde heye. Bona parastina kultura me ji gend û gemara vê politika wan, barekî giran dikeve ser milê ronakbîrên Kurd. Lî Tesîra vê politikayê xurt e. Hewqas xurt e ku ronakbîr jî bîvê nev carna di bin tesîra wê de dimîne.

Bêguman tesîra vê politikayê bi qasî Kurdan li ser Êrmenî, Suryanî û Ereban jî heye. Burjuvaziyê Tirk dixwaze Kultura Kurd, Ermenî, Laz, Suryanî û Ereban jî binî ve vemale. Iro li Kurdistanê gelek kes êdî nikarin bi zimanê xwe jî bîpeyivin. Carna ronakbîrên Kurd jî çi di azaftinê de, çi di nivîsandinê de bi Tirkî difikirin.

ARMANC: Wisa xuya ye ku tu zêdetir li ser zaravayê Dimili dixebeitî û bi Dimili dinivîsi, gelo tu dikarî li ser vê yekê hinek malûmat bidî ?

MALMÎSANIJ: Bi Dimili nivîsandina min tiştekî tebî ye, ji ber ku ez ji diya xwe Dimili fer bûm. Bi Dimili ez hêşantir fîkr û dax-wazên xwe ifade dikim. Weki din jî ev zarava ji ali ziman ve gelek arkaik û xwedî folkloreke dewle-mend e. Divê ev dewlemendî bê tesbit kirin, bê nivîsandin. Ked û xebata min ji ber vêye ye. Ji alîki de jî di tarîxa modern a Kurdistanê de ev qismê gelê me yê ku bi zaravayê Dimili dipeyivin xwedî roleke girîng e. Ger mirov Serîhildana Koçgiri, Piran (1925) û Dêrsimê (1937) vekole, ev rol berbiçav e. Ev gelê me bi destê Kemalîstêñ xwinxwar hat qirkirin û surgûn kirin. Qetlîam û nefilamên ku bi serê vî gelî de anîne, tesireke kûr û fireh li ser kultura wan bişt. Gelo avana hemû ne hêja ne ku mirov li ser bisikine, vekole, vejine?”

c) Di sala 1898 an de ji Hezanê, Mela Ehmedê Xasî Mewlûdeke Dimili nivîsi û ev Mewlûd di 1899 an de li Diyarbekirê çap bû.

Çi heyf ku Mela Ehmedê Xasî baş nayê naskirin. Ew bi xwe ji Hezanê (nahîyeke Licê) ye û di 1863 an de ji diya xwe bûye. Herweha, weki ku Hesen Hîşyar jî dibêje, Ehmedê Xasî di gel Ehmed Ramîzê Licî ji muessisên Kurd Azmî Qewî Cemiyeti bû. Ev cemiyet(komele) di 1900 an de hatibû avakirin û mirov dikare bêje ku yekem komela siyasiya millî ya Kurdi bû. Herweki ku tê zanîn, Ehmed Ramîz jîji Kurdîn Dimili ye.

d) 1903-yan de ji Sêwregê Usman Efendiye Babij jî mewlûdeke din bi dimili nivîsi. Ev mewlûd di 1933-yan de ji ali Celadet Bedir-xan ve li Şamîe hat çapkiran.

Ev herdu mewlûd, berhemên edebî yê Dimili yê herfî kevn in.

e) 1903-yan de kitêbeke Le Coq (Kurdische Texte) li Berlin(nâ) (Elmania) çap bû. Di wê kitêbê de jî çend tekstên Dimili ya Çermûgê hene.

f) 1906-an de Oskar Mann(ziman-nasek Elmanî) çend tekstên Dimili ji hêla Sêwreg, Bûcax û Bingolê berhev kîribû. Di pê re Karl Hadank (ziman-nasek Elmanî) li ser van tekstan xebitî, gramerâ Dimili nivîsand û çap kir (Berlin 1932).

g) Celadet Bedir-xan ji bo Mewlûdeke Dimili ya Usman Efendi lêkolinek wek pêşgotin nivîsiye(1933). h) Qanatê Kurdo 1939-an de li gundekî Zazayan (nêzî Batûmê) tekstên Dimili berhev kîriye. Çend sal berê jî Qanatê Kurdo di kitêbekê xwe de zaravê Kurmançî û Dimili muqayese kîriye. Ev kitêb hin çap nebuye. Weki din Qanatê Kurdo di nivîseke xwe de dibêje ku li Êrmenistan Sovyet di Peymangeha Etnografi di tekstên bi Dimili(Zazaki) yê destnîs heme.

i) 1977-an de Şex Selehedin (kûrê Şex Seidê Piran) di nav mirîden xwe de broşurek bi Dimili belav kir. Navê vê broşûre Beyatname ye, tê de malûmaten dinî hene û bi dizi hatibû çapkiran.

j) Weki din, li Tirkîyê, Hayrî Başbug (ew bi xwe Zaza ye û ji gun-dekî Hênen ye) li ser Dimili(Zaza-

kî) çend meqele û kitêb çap kîriye. Hayrî Başbug cahşek e, ku bi van xebatê xwe nokeriya dewleta Tirk dike.

j) Di 1963-yan de li Istenbolê di rojnama Roja Newe de çend tekstên Dimili hatin nivîsin.

k) Bi qasî ku wî ji me re got, Martin van Bruinessen(Hollandayî) ji hînek tişt bi zaravayê Dimili ji hêla Motkan(Bedlisê) berhev kîriye. Lî evana hîna çap nebûne.

l) Demek berê, Azad Dilêr bi navê ”Diyarbekiro Xopan o” kitêbeke şîrân çap kir.

m) İro çend kesen din wek; Zilfi, Ali Küçük, A.Kaçar li ser Dimili dixebeitin.

n) Ebubekir Pamukçu kovareke bi navê Ayre derdice. Tê de tê nivîsin ku kovara lêkolin a ziman e. Ev kovar bi elfabekê nû derdi-keve.

ARMANC: Hînek kes dibêjîn ku Dimili ne Kurdi ye. Gelo tu ci dibêji ?

MALMÎSANIJ: Belê, hînek zimannasen Awrûpayî dibêjîn ku Dimili ne Kurdi ye, lî zimanekî din ê Iranî ye. Ji vana me behsa

Oskar Mann û Karl Hadank kîribû. Weki din Joyce Blau (Li Parisê mamosta beşê Kurdi) û ji zanayen zimanen Iranî (li Sorbonê, li Parîs) Gilbert Lazard û Le Coq ji di vê baweriyê de ne.

Kovara Kizil Yol(Rêya Sor) ku li Fransayê bi Tirkî û Dimili derdi-keve jî iddiâ dike ku Dimili(Zaza) ne Kurd in.

Lî, Dimili(Zaza) ji xwe re dibêjin Kird (yan jî Kirmanc) û xwe Kurd dizanin. Bi a min ji bo ber-sivdana van spekulasyonan, divê bingeha vê zaravê bi xweş û derkeve meydanê. Digel vê, divê ev zarava bi awayekî zanistî bi zara-van din yên kurdi û zimanen Iranî ve bête muqayese kîriye. Ji bo zimannasen Kurd, ev wezifeyeke gelek girîng e. Ji ber ku metoda herî baş, metoda zanistî ye. Ci heyf ku bêyî xebata Qanatê Kurdo, ji Kurdan tu kesî di vî warî de xebateke ciddî nekiriye.

ARMANC: Bi kurtayî tu dikarî li ser rabirdûya(paşeroj) zimanê nivîsandi yê Kurdi

Dumahik 1.6

TENDURISTİ

Tatîl û Cansaxlemî

Havîn e. Li Kurdistanê her çîqas wexta kar û xebatê ye, li Ewrûpa wexta hêşabûn, tatîl(semester-urlaub) û kêtê ye. Ewrûpi, bi taybetî kirêkar û xebatkarên wan mehek tatîla xwe ya salê dixin vê demê ya li hundurê welat, piramî jî li derveyî welat diçin ber behran, welatên ku, tîna rojê, behr û perav teylîhev dibin. Li wir, dixwazin vesta xwe ya salekê ji ser xwe rakin. Li welatên Ewrûpa Kurdestanê kirêkar û xebatkar jî ne hindik in. Hinêken wan ji sber sedemî siyasi ji welat derketine û vê gavê nîkarin vejerin welat. Lî hin jî hene ku ji ber bêkarî, seqiri û belengaziyê,

warê dê û bavan berdane, hatine li Ewrûpa kar dikin. Evê han salê carekê be ji, karin ji bo demek kurt vejerin welat, hesreta dilê xwe birevinin û paşde vejerin.

Proja Kurdi ya Li Stockholm, ji bo ku dema havînê ye, gelek kirêkarên Kurdi, bi mal û zarokên xwe ve berê xwe didin welat da tatîla xwe li welat derbaskin, di bultena xwe ya Agahdarî Rênasî de (s.6) hînek şîret û agahdarî di derheqê cansaxlemiya zarokan de, belav kir. Ev agahdarî û şîret, ne ji bo Kurdestan li Swêd, ji bo hemû Kurdestan li Ewrûpa, hêjayî guhdariyê ne. Rênasî wiha dinivise:

ku mirov, zarokan ji mikrobên nav xwarinê, avê, yê ji mês û kêzikan, yê qirêja destan biparêze.

XWARIN

Bêguman gava xwarin tê kelandin mikrob dimirin. Lî gava ku xwarin sar be, wê gavê dibe ku mikrobên nû têde çêbibin. Loma divê ku mirov timî xwarina teze bide zarokan.

Mêwe (fêkî) û sebze divê baş bêne şuştin. Çimkî di qaşık û qalikên wan de dibe ku mikrob hebin. Gava ku zarok li aşxanê sebze bixwin jî divê ev sebzana baş bêne şuştin. Yan na, divê ku mirov cihê weha de mîwe û sebze nede zarokan.

A baş ev e ku havînan jî di şûna şîr de mirov mast bide zarokan. Çimkî mast bo mîde baştir e û mikrob têde najî. Gava pêwîst be ku mirov şîr bide zarokan, divê berî dayinê şîr bête kelandin.

AV

Ger mirov bixwaze ava wan deran vexwe jî divê ku nede zarokan. Ava ku mirov bide zarokan divê qasî deh deqîqan bête kelandin û pişti kelandin jî divê qapaxa wê li ser be, heta ku sar bibe.

Gava ku mirov bi mîvantî diçê cem nas û merivên xwe, dibe ku imkan tunebe avê bikelinin, sar bikin û bidin zarokan. Wê gavê, a baş ew e ku mirov çaya sivik bidê. Ji ber ku ava çayê her kelandin ye û mikrob têde tune.

MÊŞ Û KURM Û KÊZIK

Mês û kurm û kêzik li her deren qirêj hene û mikroban belav dikin. Mirov dikare bi gelek tiştan zarokan ji van mês û kurm û kêzik biparêze. Mesela: Mirov dikare perdeyeke tenik li ser cihê ku zarok lê radîzê, vegire. Her weha hînek krem û sabûnîn taybeti hene ku van mês û kurm û kêzik dûr dixin.

DEST Û RÛ

Bêguman zarokên biçûk nikarin li xwe binerin. Ji ber vê yekê, divê ku mirov çav-dêri li wan bike û ji wan re bîbêje, bila dest û ruyê xwe bişon, bi taybeti jî gava ku diçin avdestxane yan jî li derva bi axê (xweliyê) dilizin.

Her weha gava ku zarok destê xwe dixin nava devê xwe jî gelek mikroban werdigirin, ji ber vê yekê pêwîst e ku zarok berî xwarin destê xwe bişon.

Divê zarokên mezin jî fêr bîbin ku pişti çûyina avdestxanê û listina derve, destê xwe bişon. Divê her car zarok bi av û sabûnî dest û ruyê xwe baş bişon, lî bi xewliyên kesen din desten xwe zuha nekin.

Ger mirov neynûkên zarokan jê ke, wê desten wan paqijit bîbin.

Dumahik 1.7

WEXTA TATÎLÊ (SEMESTER) HÛN DIKARIN ÇAWA ZAROKÊN XWE LI KURDISTANÊ JI NEXWE-SİYÊ BİPARÊZİN?
Li havînê di dema tatîlê de tuê vejeri welat?
Ger tu vedigerî, ji bo selametiya zarokan xwe divê ku tu guh bidî van şiretan:
Gava zarok vejerin Kurdistanê, ger li wir mirov wan neparêze û çavdêriya wan neke, wê zû nexweş bikevin. Lî piraniya diyan (dayik) di vî warî de xwedî tecrübe ne.
Ew zarokan ku li Swêd mezin dibin, bedena wan wek a Swêdiyan dibe. Bedena an li dijî mikrobên ku li Swêd in, hîn xwe parastinê dibe. Gava diçin welatek din, nikarin xwe li hember mikrobên wir biparêzin û zû nexweş dikevin. Loma jî divê